Bi biriyara hikumeta Îraqê li hemî sala,16/5 roja gurên bikume

Elî Bendî

Eger mirov baş hizra xwe didîrokê de bike, wê xûyabe ku dojmnên kurd û Kurdistanê ewên dagîrker bûne egerê parçekirina Kurdistanê, bigire ji şerê çaldêran li sala 1514 ta digehe wan pîlan û rêkikeftinamên dinavbera xwe de murikirîn û welatên zilhêz temakarkirîn ta milkeçî îrada wan bibin û kurd bibine sutemeniyên berjewendên wan.

Bêguman rijêmên êk li dûf êk li Îraqê, çendîn tawan derheq xelkê Kurdistanê bitaybetî û xelkê Îraqê bigiştî didemê (35) salên deshelat

û hukmiraniya xwe de encamdane, çi jinavbirina şoreşên kurdî yên êk li dûv êk yan tîrorikirina rewşenbîr û zanayên kurd û kîmîya barankirina gundên Kurdistanê û wêrankirina bi hizaran gundan û enfalkirina (182) hizar kurdan û bê seruşûnkirina (8) hizar

Barzanîyan û talankirina mal û samanê xelkê Kurdistanê û dabeşkirina wan li ser kirêgirtî û sîxorên xwe li dûv vemanên fermî û wêrankirina xandingehan û mizgeft û dêr û cihên pîroz ku eve hemî bi cînusayid dihêne li qelemdan û zêdegavîne li ser bend û rêkikeftinamên dewletî

Piştî azadkirina Îraqê li 9/4/2003 û roxandina rijêma beis ev rastiye hemî hatine selmandin ku îraq bi êkemîn welat li qelem da bi gorên bikom taybetî ew rojname nivîsên lêgeriyan li îraqê kirîn axa îraqê bigorekê mezin pesnkir ku heta nuke nêzîkî (300) gorên bikom hatîne dîtin û (40) ji wan gorên enfalkiriyan û (3) gorên Barzaniyan û çend gorên dîtir tanuke nasnameyên wan nehatîne aşikira kirin û niyasîn.

Mezintirîn gorê bikom li devera (Hezer) li derdurê bajêrê (Mûsil) hatîne dîtin û aşikirakirina êkem gorê bikum piştî azad kirina Îraqê li devera (Mehawîl) li roja 16/5/2003 hatî ye dîtin û ev çend e bûye egerê nasandina roja 16/5/ bi roja gorên bikopm, lewa hikumeta Îraqa fîdiral bi fer dît evê rojê bi roja gorên bikom li seranserî Îraqê li qelem bide û her sal ev roje bihê saxkirin, ev çend e jî girovê rêzigirtinê û wefadarî ye bo wan qorbaniyan ewên ev rewş û aramî ye peyda kirî.

Destkeftên evro li Kurdistanê bidest vehatîn weku bîbîka çavên xwe biparêzîn û pîlanên dojimnan ji nav bibin, çinku rewşa evro li herêmê bi sanahî bidestave nehatiye, berhemê xebata bi dehan salên xebat û xoragiriyê ye, berhemê xûna bi hizaran qorbaniyane û hêvînê serhildana sala 1991 ye.

Bi fermî nasandina evan rastiya erkekê yasayiye dikevte distoyê hikumeta Îraqa fîdiral de û em hemî çaveriyê biriyara dadgeha bilinda tawanane li ser badeka enfalan ku li bere roja 10/6/2007 bihête dan hîvîdarîn hikumeta Îraqê pêngavên mezintir pavêje û girinjînê bêxte ser lêvên xêzanên enfalkiriyan ku saleha sale çaveriyê biriyarên husa daku birînên wan derman bibin weku qerebokirina wan ji aliyê madî û mînevî û xem xwarin li rewşa wan, dîsan hildana gorên bikom ewên hatîne aşkirakirin û lêgeriyan berdewam hebin bo gorên dîtir çinku em bawerîn axa Îraqê hemî bûye kiloxên sera û hestiyên mirovan, hemî jî bi şêwek ekadîmî û zanistî û0 birêka pisporên şareza divî warî de û termên wan bizivirîne cihê bab û bapîran li Kurdistana azad û li cihekê taybet û guncay bihêne veşartin û li hemî sala li vê rojê bîrewerî li wî cihî bihêne saxkirin.